*Dembaş....*

*Hem di qada navneteweyî de û hem jî di Kurdistanê de ji bo azadî, wekhevî û demokrasiyê têkoşînêke xurt a jinan heye, jinên Kurd dikarin serbilind bin ji ber ku pêşengî ji bo sistemeke nû ya demokrasiyê dikin û ispat kirine ku jinên herî jîndar ên cîhanê ne.*

*Hêjaye dema tê gotin sedsala 21 an sedsala jinê ye, ji xwe rola jina Kurd di ispat kirina vê rastiyê de heye, bêguman bi pêşketina medya ev pêşketin bileztir bûye, ev pêşketin ji bo ku bikeve xizmeta civakê divê baş were bikaranîn. Bi taybetî di civaka Kurd de ku guherîn û veguherîneke mezin tê jiyîn ji ber ku bi têkoşîneke ku di hemû qadan de civaka Kurd bi jîndarî hebûna xwe bi cîhanê dide hîs kirin û li hundurî xwe de jinûve avakirinê vedijîne.*

*Jina Kurd stûna sereke ya vê guhartin û veguhartinê ye, weke komîsyona jinê ya KNKê ji bo ku em vê jîndariya jinên Kurd li her çar aliyên Kurdistan û diyasporayê bi were parve bikin me biryar da ku bulteneke nûçeyan a jinan amade bikin,*

*Bê guman di vê bultenê de em dixwazin balê bikişênin ser pirsgirêkên ku di civakê de bandor ser jinan dikin, hem çalakiyên jinên Kurd û hem jî şideta ku dewlet û sistema serdest a dagîrker li ser jinan birêve dibin û qurbana wî jî piranî jin û zarok in.*

*Weke gava yekemîn ê ji sê mehan carek derkeve, bê guman bi alîkariya we dikare were dewlemendkirin.*

*Bi silavên germ*
*Dema we xweş be*
***Komisyona Jinan ya KNKê***

## BI TEKOŞINA AZADIYÊ EWÊ JIN ÇANDA DESTDIRÊJIYÊ HILWEŞININ

*Komisyona Jinan ya KNKê*




Siddeta li ser jinan sucekî herî giran ya mirovahiyê ye. Bi destxistina desthilatdariyê ji aliyê mêrên serdest ve jiyan li jinan û civakê teng kiriye. Bi nerînen sîstema mêrên serdest jin cinseke lawaz e û divê her dem di bin desthilatdariya mêran de tevbigerin. Li gorî berjewendiyên sîstema ku destdirêjî hemû nirxên herî giranbuha yên jin û civakê dike, divê dengên dijber dernekevin. Dema ew dengên dijber bilind dibin jî, bi hemû hêza xwe erîş dike da ku van dengên bilind bûye qut bikin.

Bedena jinê, zarok, xweza, tevna çandê û dagirkeriya xaqa welatan, ku ev awayên pêkanîna çanda tecawizê ne, qadên pêkanîna zêhniyeta serdest in. Di heman demê de ev rêbazên zordestî, destdanîna ser, standina bi zorê, milk kirin, şer, asîmîlasyon-pişaftin, şidet û destdanîna ser kedê ne. Hêzên serdest tecawiza ku ji bedena jinê dest pê dike, di her qada jiyanê de pêk tînin. Tecawiz, çekeke wisa ye, ku zêhniyeta serdest ji bo ku îradeyê bişkîne û bibe xwedî li ser jinê, kesan û gelan bi kar tîne. Di wijdana civakê de wisa dane qebûlkirin ku talan û xenîmeta herî girîng tecawiza jin û zarokan e û ev pêwîstiya şer hatiye dîtin.

Hêzên serdest yên Kurdistanê ji bi zorê dest direjî ax, nirx, ziman, nasname û hemû dewlemendiyên Kurdan dikin. Di bin navê îslamiyetê de, ji bo jinên Kurd neçin cinnetê berî îdamkirinê destdirêjî kesayetiya jinên Kurd dikin. Jinan dixin zîndanan û dixwazin pêşî li tekoşîna wan bigrin. Dayikên gerîlla weke dayikên terorîstan bi nav dikin. Li dibistanan ajantiye pêş dixin, ticareta li ser bedena jinan bi fermî didin meşandin. Jinên Kurd dixin zindanan li her çar parçên Kurdistanê, desthilatdarên li Kurdistanê baweriya xwe bi wekheviya jin û mêran tune ye. Ji jinên rêxistinkirî ditirse. Bi her awayî jin û civak rû be rûyî sîstemek dirinde ne.

Li hember vê sîstema êrîşkar, nêrînen serdest û polîtîkayên destdirêjî yên bi taybetî li her çar parçên Kurdistanê, Rojhilata Navîn û li cîhanê têkoşîna jinên Kurd a bi rêxistinkirî her ku diçe firehtir û bi hêztir dibe. Lê li hember vê yeke, mixabin hîn jî li her çar parçên Kurdistanê întixar û xwe şewitandina jinan berdewam e. Hîn qelen heye, pirjinî heye, sûneta jinan li hin

*Rue Jean Stas 41 1060 Bruxelles tel: 00 32 2 647 30 84 fax: 00 32 2 647 68 49*
*Homepage:* www.kongrakurdistan.net *E-mail:* kongrakurdistan@gmail.com / komisyonajinan@gmail.com

www.arsivakurd.org

deveran berdewame, neşandina jinan a dibistanê û pêşî li wan girtin mixabin didome. Jin hîn jî bedena xwe difiroşin. Hemû jin nebûne xwediya biryar û îrada xwe. Di nav hemû jinên çalak de yekîtiyek pêwîst nehatiye avakirin. Di salên dawî de jinên Kurd bi taybetî ji bo yekîtiya netewî di nav liv û tevgerê de ne. Ji bo xebatek hîn bi heztir pêwîstî bi xebatek rêxistinkirî ya mezin û xurt heye. Em bang li hemû jinên Kurd dikin û dibêjin ku yek jinek Kurd divê derveyî xebata jinan a azadîxwaz nemine, li hember şiddet û destdirêjiya sîstema desthilatdar, dengê xwe bilind bike. Ji bo xebatek hevbeş sedemên me jinan pir in. Di tekoşinê de israr e bibe garantiya serkeftine…

## DAXWAZIYA DADGEHEKÎ TEYBET BO JINAN LI BAŞ Û RÊ KURDISTANÊ



Di çorçeveya kampanya "em tekoşîna azadiyê bilind bikin, çanda destdîrêjiyê derbas bikin" de jinên Kurd li başûrê Kurdistanê dest bi çalakiyan kirin. Li tevahî bajarên Kurdistanê, jinan di bin dûrûşmên corbe cor de daxwaziyên xwe anîn zîman. Jinan li başûrê Kurdistanê hefteya çalakiyan ragiyand. Çalakiya jinan di 23 Mijdarê de li Bajarê Silêmanî destpêkir û heta 4ê meha 12 berdewam kir.

Di berfirehiya van çalakiyan de Rexîstîna Jinên Azadîxwazê Kurdistanê (RJAK) bi tevlîbûna 35 rexîstinên jinan li bajarên wekû Silêmanî, Kerkûk, Hewlêr, jinên Kelar û herwa Germiyan çalakiyên corbecor li darxistin. Li bajarê Silêmanî, Kerkûk bi meş, li bajarê Hewlêr bi daxuyaniyekî rojnamevanî, li bajarên wekû Kelar û Germiyan jî bi semîneran tevahî corên tûndû tîjî li ser jinê şermazar kirin û daxwaziya damezrandina dadgehekî serbixwe ya jinan kirin.

Di heman demê de jinan daxwaziyên xwe bi niviskî xistin ber destên rayedarên hukumeta herem û buroya parlementoya Îraqê. Heman dem jinan di van çalakiyan de ragiyan, ku ew amadekariya projeyekî yasayî dikin ji bo ku pêşkêş bi parlemenê herêma Kurdistan bikin. Di derbarê vê mijarê de endama komîteya amadekar ya kampamyayê ji bo destdîrêjiya li ser jînê, endama rexîstîna jinên azadîxwazên Kurdistan (RJAK) brêz Şikofe Reşît axivî û got "kampanya ku me dest pê kiriye wê heta 8 adar'a 2011'an berdewam be. Di vê dîrokê de emê wekû rêxîstinên jinan proje yasayek amade bikin di derbarê kêm kirina tevahî corên şîdeta li ser jinê pêşekêşî parlementoya herêma Kurdistanê bikin. Ji bo pejîrandina vê projê tişte ku ji dest mê bê emê bikin.

Herweha rêxistinê jinan di daxwuyaniya rojnamevanî ya bajarê Hewlêr de ragiyand ku ewê kampanya komkirina îmza bidin destpêkirin ji bo ragirtina şîrketên ku li herêma Kurdistanê bazirganî bi jinan dikin bên girtin. Mijara gotinê ye ku di van salên dawî de şîrketên ku bazîrganî bi jinan dikin roj bi roj zêde dibin û bandorekî gelek xirab li ser civakê dikin. Çalakiyên jinan bi dûrûşmên wekû "jin jiyan azadî, bila kujerên jinan neyêne berdan li zîndan " û çendîn dûrûşmên din şîdeta li ser jin hate şermezarkirin.

## REWŞA JINÊN LI ROJHILAT Û ROJAVA



Gelê Kurd li ser xaka xwe ji aliyê dewletên dagirker ve hatiye parçekirin û birevêbirin. Çand, dîrok û hebûna wan tune hate hesibandin. Tirkiye, Îran, Sûrî û Îraqê siyasetên xwe yên asîmîlasyonê bi her awayî dane meşandin û li ser civakê bandora xwe dane çekirin. Li Kurdistanê, komkujiyên fizîkî, psîkolojîk, siyasi û civakî yên ku li diji jinê ji aliyên sîstemê ve tên meşandin her ku diçe zedetir dibe. Ev erîşen ku çavkaniyên xwe ji zihniyeta desthilatdar a pênc hezar salan digire, kiryarên xwe yên dij-mirovî ku li hemberî jin û zarokên pek tînin, sînoran nas nake

Li her derê cîhanê jin, bi newekhevî, şidet, destdirêjî û her wiha bi neheqî û bêhiqûqiyê re rû bi rû dimînin. Li Efrîqayê destdirêjî, li Erebîstana Siûdî recm, li Rojhilata Navîn û Kurdistanê kuştinên di bin navê namûsê de û li Îranê darvekirina jinan trajediya jiyana jinê baştir radixe ber çavan.

www.arsivakurd.org

Li Rojhilatê Kurdistanê li ser jinan zilm û zora civakî û zordestiya rejîma Îranê her ku diçe zedetir dibe. Ji aliyêkî ve bi sûcên weke namûs û bêexlaqiyê û jî aliyê din ve ji ber sûcên siyasî têne girtin, kuştin û îdam kirin. Suheyla Qadirî, Zeyneb Bayezîdî, Dr. Ruya Tiluî, Şîrîn Elem Hûyî û bi dehan keç û jinên din ji ber sûcên siyasî yan jî namûsî hatine mahkemekirin û darvekirin.

Sedem çî bibe bila bibe, darvekirina jinan a li Îranê êdî bûye bûyerek ji rêzê. Her roj di zindanên reş û tarî de jinên li benda îdamê ne rondikên çavên xwe vedişêrin, da ku dilê celadên wan pê geş nebe. Di roja îro de îdamkirina jinan herî zêde li Îranê tê pêk anîn. Her sal bi dehan jin ji ber sedemên cur be cur tên darvekirin. Bi taybetî jî di destpêka rêjîma Ayetûllah Xumeynî de, jinên ku li hemberî rejîma Îranê radiwestin an jî jinên ku îslamiyeta li gorî zêhniyeta desthilatdaran qebûl nedikirin, pêl bi pêl dihatin darvekirin. Di roja îro de jî sedemên darvekirina gelek jinan bi pîvanên îslamê ve tê girêdan.

Li Rojhilata Kurdistanê, Zeyneb Celaliyan yekemîn keça Kurd e ku bi tawana endametiya partiyeke siyasî hukmê îdamê bi ser de hatiye birîn. Zeyneb Celaliyan di sala 2008an de li bajarê Kirmaşanê ji aliyê hêzên rejîma Îranê ve hate binçavkirin û girtin. Piştî demek dirêj di 14ê çile ya sala 2009an de, di rûniştineke ku 7 deqîqe dewam kir de, li Zeyneb Celaliyan cezayê îdamê hate birîn.

Li ser banga Zeyneb Celaliyan jinên Kurd ketin nav hewldanan û ji bo rawestandina cezaya îdamê ya li keça Kurd hatiye birîn kampanyayên îmzeyê dan destpêkirin. Her wiha Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî jî bi daxuyaniyek nivîski bang li dewleta Îranê kir û xwest ku cezaya darvekirina Zeyneb Celaliyan bê rawestandin. Lê belê bûyerên dawî xuya dikin ku ev hewldanên jinên Kurd û rêxistinên navneteweyî be bersiv man.

Li Rojavayê Kurdistanê rejima dewleta Sûrî bi meşandina siyaseta Erebkirin û asîmîlasyonê ya li ser Kurdan, rewşa civakê her ku çû zêdetir xiraptir kir. Dewleta Sûrî, ango rejîma Bees bi rêya siyaseta xwe ya nerm, hewl dide ku civak û jinê ji cewher, rastiya afrîner û xwezayiye dûr bixe. Ji aliyêkî ve bi riya nûjeniya kapîtalîst, rêbazên weke sipor, seks û hunerê jinê bi perglala mêr ve girêdide, ji hêla din ve jî di riya kevneşopiya malbatê de mijara namûsê belav dike.

Lê bi derketina Tevgera Azadiyê rewşa civakê hate guhertin, gelê Kurd bi taybetî jî jinan xwe bi îdeolojiya tevgera azadiyê ve birêxistin kir. Raman û îdeolojiya tevgara azadiyê bandoreke mezin li ser jinê dabû çêkirin û jinan ji bo ku azad bibin kom bi kom xwe li tevgera azadiyê girtin û tevlî nava refên azadiyê bûn. Jinên Kurd ji bo balê bikşînin ser bi giştî rewşa jinan û li dijî çanda tecawizê ya pênc hezar salan ku dil, raman û hestên jinê dagir kiriye têdikoşê.

Tevgera azadiya jinên Kurd bi minasebeta 100emin salvegera 8ê adarê kampanya têkoşina azadiye bilind bikin, çanda tecawizê têk bibin dan dest pêkirin. Kampanya li rojhilat û rojaveyê Kurdistanê jî bi çalakî, civîn û perwerdeyan hat dest pêkirin û ewê bi çalakiyên cur be cur bê berdewamkirin.

Jin, ji bo ku ji koledarî û çanda tecawizê ya pênc hezar salan re bêjin êdî bes ê pêwîste di nava têkoşineke bê hempa de bin.

## LI HEMBERÎ KIRYARÊN ZORDESTIYA ÎRANÊ BÊDENG NEMÎNIN

*Komisyona Jinê ya KNK ê*

Em, kiryarên hovane yên dewleta Îranê, ku li dijî girtiyên PJAK û siyasiyên Kurd dimeşîne, bi tundî şermezar dikin. Siyaseta rêvebiriya Îranê ya dardekirinê, ne di hiqûq de, ne di demokrasî de, ne di mafên mirovan de û ne jî di rêbazên ademiyetê de hene. Bi yek gotinê ev hovîtî ye.

Dewletê Îranê, ji bo ku kes û eniyên ji bo mafên demokratîk û azadiyê, ji bo jiyaneke bi rûmet têdikoşin bitirsîne, ceza bike û berteref bike, siyaseta dardekirinê, ji berê ve bikartîne. Bi siyasetên kuştin, mirin û dardekirinê dixwaze ku gelan teslîm bigire û wek kole bikarbîne. Bi kanûnên antî-demokratîk mafên insanî û xwezahî têne binpêkirin. Mafê parastinê jî nayê dayin û bi cezayê dardekirinê kesan darde dikin.



Dewleta Îranê girtiyan, ji raya giştî vedişêre û bi awayekî dizî û nepenî wan darde dike. Hîna jî gelek girtî wek rehîn têne girtin û li benda dardekirinê ne.

Rejîma Îranê di 14ê çileya 2009an de, parêzvana mafên mirovan Zeyneb Celaliyan, bi 19 hevalên wê ve girtin binçavan û ti agahî ji Celaliyan nehate standin. Di encamê de keça Kurd Zeyneb Celaliyan, bi cezayê dadekirinê hate ceza kirin. Lê, hate zanîn, ku Zeyneb Celaliyan di girtîgeha Tahranê Evîn û gelek girtîgehên din de hatiye girtin û di bin êşkenceyên hovane û dûrî însanî de hatiye derbas kirin û tecrîd kirin.



www.arsivakurd.org

Herî dawî derkete holê, ku Zeyneb Celaliyan di meha îlonê de, di girtîgeha Kirmanşah de hatiye bi cih kirin. Ji sedema êşkenceyên dijwar û sîstematîk û berdewamî yên li ser aktivîsta Kurd Zeyneb Celaliyan, tenduristiya wê xerab bûye û gihaye qonaxa metirsînê. Her demê jî dikarê were dardekirin.

Ev trajedî, ne tenê li ser Zeyneb Celaliyan tê meşandin; li dijî bi dehan girtiyên siyasî yên Kurd tê meşandin. Ji ber ku bi dehan girtiyên siyasî yên Kurd li bendeyî dardekirinê rehîn têne girtin û tê xwestin ku gelê Kurd, bi dardekirinan werê tune kirin. Ji bo ku dardekirinên li Îranê werin rawestandin, pêwîste herkes rabe ser lingan. Konsolosxane, sazî û dezgehên Îranê bi tundî werin protesto kirin. Em bang li partiyên siyasî yên Kurdan jî dikin û dibêjin: Ev siyaseta Îranê ya qirkirina Kurdan e, pêwîste Kurd tev di nava yekîtiyeke dilsoz de, li dijî Îranê hereket bikin û dijberiya xwe nîşan bidin.

Em bang li Neteweyên Yekbûyî, li Yekîtiya Ewrûpa û li sazî û dezgehên demokratîk û li hemû raya giştî ya cîhanê dikin, ku li dijî siyaseta Îranê ya hovane, bi awayekî lezgîn dengê xwe bilind bikin û dijberiya xwe nîşan bidin. Li Zeynep Celaliyan xwedî derkevin û dardekirina wê bidin rawestandin. Ev, ji bo herkesî binbarî û berpirsiyariya wijdanî û însanî ye.

Em bang li tevahiya cîhanê dikin ku li hemberî vê kiryara hovane derbikeve û nebe hevkarên siyaseta sucê mirovahiyê.

## REWŞA GIRTIYÊN LI SÛRIYÊ



Partiya Bees ya ku di 7ê Nisana sala 1947 de hatiye damezrandin û rejima Sûri birêve dibe, bi salane li ser Kurdan û kêmnetewên ku li ser erdnîgariya Sûrî dijin, siyaseteke qirêj, tinekirin û asîmîlasyonê dide meşandin.

Di sala 1962 de kembera Erebî bi plana bi cîhkirina gundiyên Ereb li herêmên Kurdan û rojavayê Kurdisanê ji beşên din ên Kurdistanê were qutkirin hate avakirin. Yanî bi awayekî şênber kûrkirina parçekirin û qirkirina çandî li Kurdistanê ye. Di 13ê meha 11 sala 1963an de bûyera şewata sînemaya Amûdê pêk hat û di encama wê de nêzîkî 250 heta 300 zarokên di temenên 9 heta 13 sali hatin şewitandin.

Her wiha ev siyaset dewam kir û vê care bi awayekî din, li girtîgeha Hesekê di sala 1992 de girtî bi hovîtî hatin şewitandin.

12ê Adarê sal 2004 ev car li Qamişlo leşgerên Sûriyê êrîşeke hovane birin ser Kurdistaniyên bê guneh, gule li ser wan barandin û komkujiyek din li ser kiryarên xwe yên berê zêdekirin.

Rejîma Bess bi gelek şêwazên din sistema xwe hina bi rê ve dibe. Mafên Kurdan ên nasname nayê dayin, Kurd li gorî kanûna nû ya xala 49an ji erdên xwe dibin û ew erd dibin milkê Erebên ku li wêderê bicîh bûne. Li ser Kurdan zordestiyeke mezin heye. Ji ber vê yekê jî, Kurd nikare li mafên xwe xwedî derkevin. Kesên li mafên xwe xwedî derkevin jî, yan tên girtin an jî tên kuştin. Li girtigahan rastî nêzîkbûnên xirab tên. Ji her mafên xwe yên rewa bêpar dimînin. Lewra girtiyên siyasî ji bo ku mafên xwe yên rewa bi dest bixin, serî li rêbaza çalakiya birçîbûnê didin.

Di 30ê Cotmehê de, endam û dostên Partiya Yekîtiya Demokrat PYD, yên di girtîgeha Edra ya li navenda paytexta Sûriyê Şamê de girtînin, dest bi greva birçîbûnê kirin. Li gorî daxuyaniya girtiyên Kurd, daxwaza wan a sereke ji vê çalakiyê ewe, ku dewleta Sûrî bi awayekî demokratiyane pirsgirêka Kurd li Sûrî û rojavayê Kurdistanê çareser bike. Li gorî çavkaniyên PYDê, girtiyên Kurd, ên ku hejmara wan digihêje 300 kesî li zindana Edra, rastî êşkence û kiryarên xerab ên dervî mirovahiyê dibin û herweha girtiyên Kurd ji hemû mafên danûstandina bi derve re û mafên ku ji girtiyên din re tê dayin, bêpar in.

Li gorî çavkaniyên ji rojavayê Kurdistanê tên, heta niha tu agahî li ser rewşa girtiyên di grevê de tune ye û hemû hewldanên malbatên girtiyan û parêzeran ên ji bo hevdîtina bi girtiyan re bê encam man. Di derbarê vê çalakiyê de PYD daxuyaniyek da. PYD di daxuyaniya xwe de ji dewleta Sûrî daxwaz kir, ku bi awayekî lezgîn hemû girtiyên siyasî yên Kurd serbest bike û destûreke nû ji welat re deyne da ku mafê gelê Kurd û hemû kêmnetewan li Sûrî were misoger kirin.

PYD di daxuyaniya xwe de diyar kir ku her ku dem diçe gumanê ji jiyana girtiyên di greva birçîbûnê de dikin û xeterî li ser jiyana wan her ku diçe mezintir dibe û dewleta Sûrî hişyar kir ku tiştek ji girtiyan bê, berpirsyar wê dewleta Sûrî be. Her wiha ji bo piştgiriya çalakiya greva birçîbûnê ya girtiyên PYDê yên di zindana Edra yê de, li Ewrupa jî gelê Kurd gelek çalakî li darxistin.

Rêxistina PYD li Ewrupa li gelek bajaran çalekiyên wekî li Brukselê çalekiya birçîbûnê, li Cenêva Swîsreyê çalakiya birçîbûnê û dayina dosyayek ku têde daxwazên xwe nivisandine ji heyeta Neteweyê Yekbûyî re, li Berlîna Almanyayê nobet girtin. Li Viyana Awûstûryayê, li bajarê Danîmarka Kopenhagê, li Qibris, li paytexta Îngîlistanê Londonê û bajarê Norveçê Osloyê çalakiyên bi meş hatin li darxistin. Herweha hejmarek ji rewşenbîrên Kurd û di bin duruşmeya EM

BI WE RE NE greva birçîbûnê li bajarên Acheen û Oldenburga Elmanya lidar xistin.

Di her çalakiyê de, li pêşiya balyozxaneya Sûrî mîtingên şermezarkirinê hatin orgenîzekirin. Di çalakiyên piştgiriya girtiyên PYDê de, ji raya giştî û saziyên mafên mirovan hat xwestin, ku bi awayekî cidî li rewşa girtiyan xwedî derkevin û herweha bi awayekî lezgîn hewl bidin ku rejîma Sûrî hemû girtiyên siyasî serbest bikin.

## NAMEYA ELIF ULUDAG,

*ENDAMA KOMA AŞITI*



Endama Koma Aştî û Çareseriya Demokratîk Elîf Uludag, ku li ser banga Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan di 19'ê Cotmehê de ligel 34 endamên komê çûn Tirkiyê û piştre ligel 10 endamên komê hate girtin; û niha li Girtîgeha Tîpa E ya Amedê ye, bi riya parêzerên xwe nameyek vekirî ji raya giştî re şand. Uludag, di nameyê de diyar kir ku dema ew hat gotibû "Ez hatim, ger ku şert û merc bên amadekirin kurên min jî wê bên". Uludag, anî ziman ku piştî hate girtin û ew avêtin nava 4 dîwaran, hêviyên wê yên aştiyê jî hatin girtin û wiha got: "Serokwezîr Tayîp Erdogan gelek caran bang li dayikan dike. Lê daxwazên wan li ber çavan nagire. Dîsa Wezîrê Dadê Sadûllah Ergîn dibêje 'Xweziya venegeriyana û tevlî pêvajoyê bibûna wê demê em jî dipirsin. Ger hun ji dil û samîmî ne, vayê em 10 kes girtî ne. Me berdin û rê li pêşiya me vekin ku em karibin beşdarî pêvajoya aştiyê bibin."

Endama Koma Aştî û Çareseriya Demokratîk û dayika sê zarokan Elîf Uludag, bi riya parêzerên xwe di derbarê gotinên serokwezîr Erdogan, ên li hemberî dayikan kiribû nameyek vekirî şand. Uludag, bang li Erdogan kir û wiha got: "Em 2 dayik di nava komê de bûn. Disa Koma Mexmûrê jî hemû ji dayik û zarokan pêk dihat. Hemû mexdûrên şer bûn. Me bi salan gelek zor û zehmetî kişand. Wê demê dê bipirsin "Te çima nexwest dengê van dayikan bibihîzî?" Tu dibêjî 'xweziya venegeriyana Mexmûrê.' Ger ku tu ji dil bî wê demê 10 kesên niha girtî beşdarî pêvajoyê bike.

Endama Koma Aştî û Çareseriya Demokratîk Elîf Uludag diyar kir ku di nava vê pergalê de dayikbûn karekî pir zahmet e û wiha got: "Ez piştre fêrî nasnameya xwe ya kurdîtiyê bûm. Temenê min 15 salî bû hêj min nizanibû ez Kurd im. Zarokatiya min bi nezanebûnê derbas bû. Min xwe û nasnameya xwe nas nedikir. Dibêjin kesayetiya mirovan di zarokatiyê de dibije. Lê ya min ne wisa bû. Ez ji xwe dûr ketibûm. Piştre ez kurdîtiya xwe ji keseki Tirk Hakî Karer fêr bûm. Hê jî çand, ziman û nasname tên înkar kirin. Lê min beriya sala 1980'ê ji hevalekî xwe yê Tirk kurdîtiya xwe nas kir."

Uludag, di dirêjahiya nameya xwe de bal kişand ser zor û zahmetiyê dayikan û wiha lê zêde kir: "Dema ez bûm dayik min got, 'ez vê êşê bi zarokên xwe nadin jiyandin. Min got ez ê nasname, çand, ziman û cewherê wan bi wan bidin naskirin. Min got ez ê berpirsiyariya xwe ya dayiktiyê bi cih bînim. Min sond xwaribû. Lê mixabin pişt re min dît ku ev yek pir dijwar e. Piştî ez ketim nava têkoşînê min fêm kir ku tenê bi welidandinê mirov nikare bibe dayik. Ez dereng fêr bûm ku di nava van şert û mercan de, di nava vê pêvajoyê de welidandin sûc e. Min ji xwe re got 'madem tiştekî ku ez bidim wan tune, min çima ew anîn dinyayê?' Bê guman ti tişt bi qasî mirov giyanê bide mirovan pîroztir tune, lê di pêvajoya ku jiyanê li mirovan bikin jehr wê demê ew giyan bê wate dimîne. Dayikbûn tişteke pîroz e, lê ez li dayikbûnê poşman kirim. Ji bo wekî dayikekê ez tiştên herî baş û xweş bidim zarokên xwe min mirin jî da ber çavên xwe. Min xwest ez rûmet û azadiyê bidim wan. Lê kesên li ser xwîn û şer rantê dikin, hemû cîhan zivÎrandin qada şer. Ez jî, weke dayikekê, min xwest di nava cîhana şer de li azadiyê geriyam û ji bo zarokên xwe ketim nava têkoşîna edalet, wekhevî û aştiyê. Tiştê ku min ji bo xwe xwest, min ji bo hevalên xwe jî xwest. Ez her tim li heq û edaletê geriyam."

Dema ez li vê pêvajoyê dinerim dilê min diêşe. "Erdogan behsa Dayika Sakîne kir. Got 'Êşa hemû dayikan yek e' Wê demê pêvajoya hatina me anî bîra min. Birêz Erdogan wê demê tiştên xweş digot. Digot 'Bila rondikên çavan rawestin', 'Bila êdî dayik negirîn' 'We di şer de qet zarokên xwe winda kirin?', 'Em neçar in pirsgirêka Kurd çareser bikin'. Wê demê em pir kêfxweş û bi hevî bûn. Min xwe weke dayikekê pêşniyazê Koma Aştiyê kir. Min got bila kedek min jî tevlî çareseriyê bibe. Belkî şer bi dawî bibe û tarî ronî bibe û belkî tavên aştî ji nûve şîn bibe. Min got bila li şûna êş û şînê şahî pêk bên û bila êdî ev êş bi dawî bibin û dayik negirîn. Min got dibe ku aştî pêk bê zarokên min jî bigêjin aramiyê û min di nava Koma Aştiyê de cih girt.

Uludag, bang li Erdogan jî kir û wiha berdewam kir: "Erdogan bang li dayikan dike û dibêje êşe hemû



www.arsivakurd.org

dayikan yek e. Em ji komê 2 dayik bûn. Dîsa bavekî ku zarokê xwe yê yek salî hiştibû û hatibû çiyê hebû. Dîsa koma Mexmûrê jî hemû ji dayik û zarokan pêk dihat. Hemû mexdûrên şer bûn. Wê demê ma dê nepirsin 'Te çima dengê van dayik û bavan nebihîst? Ma dê nepirsin vana ji ber ku şert û mercên jiyanê li Tirkiyeyê nedîtin vegeriyan Mexmûrê. Ez wekî dayikekê ji Erdogan re wiha dibêjim: "Ger ku tu bi rastî ji dil û samîmî be. Ger ku tu dixwazî wekî kesek aştîxwaz têkevî nava rûpelên dîrokê, wê demê tu çawa nêzîkî gelê cihanê û yên din dibî wisa nêzîkî gelê Kurd û dayikên Kurd jî bibe. Em bi hevre dawî li vî şeri bînin Ez jî wekî dayikekê dê piştgiriyê bidim."

Uludag, di dawiya nameya xwe de bang li Wezîrê Dadê Sadullah Ergin jî kir û xwest samîmî tev bigere. Uludag wiha dawî li nameya xwe anî: "Hun dibêjin 'Xwezî venegeriyana Mexmûrê. Xwezî beşdarî pêvajoyê bibûna. Wê demê ez jî ji we dipirsim. Ger ku hun ji dil bin û samîmî bin vayê em 10 kes niha girtî ne û rê li pêşiya me veke ku em karibin piştgiriyê bidin pevojoyê. Êdî em poşman nebin. Her ku hun rê li pêşiya me vekin em jî wekî 10 endamên Koma Aştiyê dê piştgiriyê bidin pêvajoya aştiyê. Lê ez bawer nakim hun samîmi bin. Hun vê yekê ji bo hilbijartine bikar tînin. Ger ku hun destê xwe deynin ser wijdanê xwe û durist tev bigerin em ê karibin bi hevre aştiyê bînin vî welatî.

## KONFERANSA NETEWI YA JINÊN KURD

*Gruba Hewldanê Ya Jinên Kurd*

"Konferansa Jinên Kurd" a bi navê "di pêşvebirina demokrasiyê de rista jinan" di 24-25'ê Nîsanê de li Amedê bi pêşengiya Tevgera Jinên Azad û Demokratîk (TJAD/DOKH) hat lidarxistin. Di encama konferansê de biryarên gelek girîng hatin girtin. Ji bo yekitiya Kurdan ev konferansa jinên Kurd bû gaveke dîrokî ya destpêkê..

Ji her çar parçeyên Kurdistanê, ji Rusya û ji dîasporayê bi qasî sed û pêncî delegeyan ev konferansa dîrokî pêk hat. Armanca herî girîng ya vê konferansê ew bû ku jinên Kurd di destpêkê de di nav xwe de bingeha yekitiya xwe bihonin û paşê jî ji bo jinên Rojhilata Navîn bikevin nav hewldanan.

Di konferansê de jinan bi giranî ev biryar û tesbitên li jêr kirin:

"-Şîdeta li hember jinan û binpêkirina gelek mafan li ser erdnîgariya Kurdistan û cihanê bi her awayî didome....

-Jin rûxandinên ku di encama şer û pevçûnan de derketine holê, hem li ser bedena xwe, hem li ser erdnîgariya xwe û hem jî li ser gelê xwe dijîn. Ji ber ku têkoşîna jinan a azadiyê, tenê têkoşîna rizgarkirina zayendî nîn e, di heman demê de demokratîkkirina di welatên ku lê dijîn de têkoşîna aştiyeke birûmet, rêzdariya ji bo maf û azadiyan, ji bo qebûlkirina nasnameya cins û neteweya xwe, mecbûr dimînin piştgiriyê bidin hev û terûbeyên xwe parvebikin.

-Careke din jin ê zewacên bi zorê, berdêlê, tunehesibandina jinan, kuştinên li ser navê "namûs" û recmê bibînin û tecrûbeyên xwe yên di vê têkoşînê de bi sekneke hevpar, bi hev re par ve bikin.

- Dîsa jin xwedî bersiveke hevpar a li dijî red, înkarkirin û tunehesibandina nasname, ziman û çanda xwe ne jî. Di Rojhilata Navîn de cudahî wek dewlemendiyê nayê dîtin, berevajî wê, tim bi feraseta dewletan a mêrî, milîtarîst û zordestiyê "tunekirinê" esas digire. Jin ê li hember vê yekê jî hêza xwe bigihînin hev û têkoşîna xwe bidomînin."

Di encamnameya konferansê de biryara "Gruba Hewldanê Ya Jinên Kurd" jî hat wergirtin. Li gor tespîtan pêşniyarên wê rojê grub ê jî 17 kesan pêk bihata. Lê li ser hewcedariyê hejmar derket 22 kesan û grubê civîna xwe ya yekemîn di 18-19'ê Îlona 2010'an de li bajarê Duhokê pêk anî. Bi nîqaş û guftuguhên ku du rojan berdewamkirin, li ser kêşeyên neteweyî û pirsgirêken zayendî yên jinê hat rawestandin.

Di encama vê xebatê de jî Gruba Hewldanê gihîşt van biryarên li jêr:

-Ev grup ji bo ku aştiyeke mayînde li Kurdistanê pêk bê, dê çi bikeve ser milê wê bi cih bîne. Xuyaye ku li cihanê di hemû şeran de zirara herî mezin jinan dîtiye û dibînin jî. Jinên Kurd jî weke hemû jinên cîhanê, di avakirina aştiyeke domdar a li tevahiya Kurdistanê de wê rola xwe ya dîrokî bilîze. Li ser vê esasê pirsgirêka Kurd bi awayeke aştiyane û demokratik bê çareserkirin biryara şerê ku li Kurdistanê didome bê rawestantandin, kar û xebatan bike daye.. (Li ser vê esasê ji Serokkomarê Tirkiyeyê Birêz Abdullah Gul re, ji Neteyên Yekbûyî re, ji Serokatiya Konferansa Îslamî re û ji KCK'ê re biryara nivîsandina nameyan hat dayin.



- Ji bo ku Konferansa Neteweyî ya Kurd bi lezgînî bicive, ev grup ê kar û xebaten xwe yên serlêdana hemû partiyên siyasî û tevgerên cûda yên li Kurdistan û seranserê cîhanê bidomîne.

www.arsivakurd.org

-Her wiha Gruba Hewldanê ji bo çareserkirina pirsgirêkên neteweyî, tekoşîna azadiya zayendî û tundiya li ser jinê kar û xebatên ku tên kirin hemû di navendekê de bên plankirin û şopandin, biryara avakirina “Navenda Jinê” da.

**GRUBA HEWLDANÊ YA JINÊN KURD**

***Leyla ZANA,*** *Xwediya Xeleta Sakharov;* ***Narmîn OSMAN,*** *Wezîra Karên Hawirdorê ya Parlementoya Îraqê;* ***Ala TALABANÎ,*** *Parlementera YNK’ê Parlementoya Îraqê;* ***Şîrîn AMEDÎ,*** *Sefîra Aştiyê ya Neteweyên Yekbûyî ya Herêma Federe ya Kurdistana Îraqê;* ***Dr. Kajal RAHMANÎ,*** *Zanîngeha Harvardê;* ***Fatma KURTULAN,*** *Parlementera Wanê ya BDP;* ***Amine ZIKRî,*** *Parlementera PDK’ê ya Parlementoya Herêma Federe ya Kurdistanê;* ***Feleknas UCA****, Parlementera berê ya Parlementoya Ewrûpayê;* ***Nasik TOFİK,*** *Parlementera Partiya Yek-Girtî Îslamî ya Parlementoya Herêma Federe ya Kurdistanê;* ***Sabri BAHMANY,*** *Endama Rêveberiya Komala PSDK;* ***Sayran ABDULLAH,*** *Berpirsa Jinan a Gruba Goran - Parlementoya Herêma Federe ya Kurdistanê;* ***Yuksel AVŞAR,*** *Alîkara Serokê Giştî yê KADEP’ê;* ***Zozan EKMEN,*** *Civaknas - Temsîlkara HAKPAR;* ***Çaglar DEMÎREL,*** *Şaredara Dêrikê;* ***Hanife HEBU,*** *Aktivîsta Mafên Jinan;* ***Mulkiye BİRTANE,*** *Nivîskar;* ***Gul KIZILTAŞ,*** *Aktivîsta Mafên Jinan;* ***Ayşegul DOGAN,*** *Rojnamevan;* ***Reyhan YALÇINDAG,*** *Parêzer-Parêzvana Mafên Mirovan;* ***Necibe OMER,*** *Aktivîsta Mafên Mirovan;* ***Şîno Abdûlmecit REŞID,*** *Nunera Hizbî Şîu.*

## HEYETA JINÊN KURD LI KURDISTANÊ

**Jinên Kurd ên ji Tirkiyeyê li Duhokê yekemîn civîna xwe pêk anî**

Jinên Kurd ên li Hêrama Kurdistana Federal hatin cem hev, li Navenda Ronakbîriya Zanîngeha Duhokê civîna çapameniyê li dar xistin.

Di civîna çapameniyê ku rastî eleqeyek mezin hat de, Endama Koma Teşebûsa Konferansa Jinên Kurd û Parlementoya Îraqê Ala Talabanî, diyar kir ku jinên Kurd amadekariya 2'yemîn Konferansa Jinên Kurd dikin.

**Ala Talabanî: Hewce ye di zûtirîn demê de Konferansa Neteweyî pêk bê**

Parlamenter û endamên partiyên Herêma Kurdistanê yên jin ji bo amadekariya 2'yemîn Konferansa Jinên Kurd a li Herêma Kurdistana Federal pêk bê, hatin cem hev.

Perlemantera Kurd a YNK’ê û Endama Parlementoya Bexdayê Ala Talabanî, diyar kir ku pêwîst e di demek zû de konferansa neteweyî bê sazkirin. Pêwîst e tevgerên siyasî yên Kurd bigihijin wê astê ku



biryareke qenc bidin ku êdî konferansa neteweyî zêdetir neyê taloqkirin. Pêwîst e di demek diyarkirî û zû de konferansa neteweyî bê lidarxistin. Wekî jinên Kurd her çend pirsgirêkên me yên cuda jî hebin, lê dîsa jin li her çar parçeyên Kurdistanê hatin cem hev. Pêwîst e zilam û partiyên siyasî jî pêngaveke wiha biavêjin û konferansa neteweyî li dar bixin.”

Talabanî, diyar kir ku gelê Kurd aştîxwaz e û ti deman şer nexwestiye û wiha dewam kir: “Dîrok şahide ku gelê Kurd ti caran axa kesê dagir nekiriye û Kurd ji bo xweparastinê çek bi kar aniye." Ala Talabanî xwest ku her kes erka xwe bi cih bîne da ku Tirkiye jî bersiveke erênî bide bêçalaktiya KCK'ê û dewlet jî agirbestê îlan bike."

**Nasik Tofîq: Ligel cudahiyan jî divê Kurd konferansa xwe saz bikin**

Parlamentera Yekgirtûyî Îslamî Kurdistan a Herêma Kurdistanê Nasik Tofîq jî li ser girîngiya konferansa neteweyî sekinî û wiha got: “Astengiyan rê li ber pêkanîna konferansa neteweyî girtiye. Kurd li her parçeyê Kurdistanê xwedî taybetmendiyên cuda ne. Mînak; her çend başûrê Kurdistanê xwedî statûyeke siyasî be jî dîsa gelek pirsgirêk di navbera Herêma Kurdistan û Bexdayê de hene û nehatine çareserkirin.” Tofîq diyar kir ku ev nayê vê watayê ku em çavê xwe li parçeyên din bigirin û got Kurdan hewcedarî bi rêxistineke berfireh heye û wiha lê zêde kir: "Her wekî Rêxistina Cemaeta Erebî, lazim e rêxitineke me Kurdan jî hebe ku hemû Kurdên cîhanê bigire nav xwe û biryarên siyasî û stratejîk bide.” Tofîq da zanîn ku lazim e di zûtirîn demê de konferansa neteweyî ya Kurd bê lidarxistin.

**Seyran Abdûla: Bo konferansê zext bidin partiyan**

Ji Tevgera Goran Seyran Abdûla jî der barê xebatên amadekariya 2'emîn Konferansa Jinan de agahî dan û wiha axivî: "Di civîna amadekariya Konferansa 2’mîn a Jinan de em li ser dû xalên sereke sekinîn. A yekemîn girêdayî jinan û sazkirina Konferansa Duyemîn a Jinan

www.arsivakurdi.org

bû. Ya duyemîn jî me giftûgo li ser pêwîstiya pêkanîna konferanseke neteweyî kir. Lazim e em li ser hemû partiyan zextan çêkin, da ku di zûtirîn demê de pêk bê. Her wiha pêwîst e her yek ji me jî li ser partiyên xwe zextan bikin da ku amadekariyên konferansa neteweyî dest pê bikin."

**Reyhan Yalçindag: Ji bo konferansa neteweyî ya Kurd bila her kes çalak be**

Endamên Koma Hewildanê û aktîvîsta mafên mirovan Prz. Reyhan Yalçindag, der barê têkiliyan agahî da û diyar kir ku jinên ku Kurd heta bigijin azadiya xwe û mafên xwe yên çandî û neteweyî pêkbînin dê têkoşîna xwe bidomînin. Yalçindag, diyar kir ku wan bang li hemû jinên cîhanê kirine û wiha axivî: "Me encamnayeke li ser hejmara benda NY'ê ya 1625'an, ku jin ji bo çareserkirina pevçûnên çekdariyê roleke aktîf bistîne, serarast dike ji rayedarên NY'ê yên Hewlerê re pêşkêş kir. Me bang li raya giştî ya cihanê, derdorên aştîxwaz û demokratîk kir. Me der barê pevçûnên li erdnîgariya Îran û Tirkiyeyê de ji bo ku rewşa bêpevçûnî pêk bê, pirsgirêka Kurd bi riyên aştiyane û demokratîk çareser bibe, gihiştina Kurdan a mafên mirovan ên bingehin, bang li her kesî kir." Yalçindag, da zanîn ku wan ji Serokomar Abdullah Gul re name şandiye û wiha pê de çû: "Me ji Tirkiyeyê xwest ku biryara bêçalakiyê bidomîne û ji rayedaran jî xwest ku operasyon bên rawestandin. Me xwest gavên lezgînî bên avêtin. Her wiha mafên bingehîn di makezagonê de cih bigire. Dema ku em li vir aliyekî ku be bang kirî KCK biryara dirêjkirina bêçalakiyê da. Ev biryar hêvîya me ya ji bo aştiyê zêde kir. Divê ev biryara bê çalakiyê bê bersivandin."

Yalçindag, derbirî ku heta aştiyeke mayînde pêk bê ew dê têkoşîna xwe pêş bixin. Yalçindag, wiha dirêjî da axaftina xwe: "Dema em hatin vir li Colemêrgê li hemberî mirovên sivîl qetlîamek pêk hat. Dîsa di roja arefeyê de operasyonek hate lidarxistin û 10 gerîla jiyana xwe ji dest da. Ev pirsgirêk didome , em wekî jinên Kurd ku di van pevçûn û şeran de herî zêde zerarê dibînin ji bo ku aştiyeke mayînde pêk bê, em dê têkoşîna xwe ya aştiyê bilintir bikin." Yalçindag, balkişand ku wan herî zêde li ser Konferansa Netewî ya Kurd têkiliyên xwe pêş xistine. Yalçındag, wiha axivî: "Em di vê konferansa ku pêk tê de rolekî aktîf digirin û xebatên xwe dimeşînin. Li vir em bi hemû derdorên ku di parlementoyê de cih digire, hatin ba hev. Em hatin ba nûnerên partiyên siyasî, aktorên siyasî. Em wekî jin bi biryarin ku ev bêdadî û bêwekhevî rabe."

**Zozan Ekmen: 'Ji bo me nasnameya jin û neteweyî yek e'**

Endama Hewldanê û ya HAKPAR'ê Zozan Ekmen jî diyar kir ku jinan di konferansa jinan a Amedê de banga Konferansa Netewî ya Kurd kiriye û wiha axîvî: "Di van civînan de me li ser vê mijarê biryar girt. Li çar perçeyên Kurdistanê û Ewrûpayê xebatên lobî dê bimeşînin. Bi taybetî me ev peyam da. Me hemû cudahiyên xwe yên siyasî, ramanî, mezhebî dan aliyekê nasnameya xwe jin û ya neteweyî yekgirt. Li ser vê yekê têkiliyên me baş diçin. Difikirim ku em ji bo hemû Kurdan mimkune. Ji ber vê yekê ev civina jinan û ev hewildana girîngin. Ev civîn ji bo konferansa netewî bangeke û hêvî dikim ku tu kes guhê xwe ji vê yekê negire."

**Endamên Hewldana Jinên Kurd bi Barzanî re hatin cem hev**

Endamên Hewldana Jinên Kurd, bi Serokê Herema Federal a Kurdistanê Mesût Barzanî re hatin cem hev. Heyet piştî Barzanî bi Serokê Hikumêtê Berhem Salih re jî hevdîtinek pêkanî.

Barzanî di hevdîtinê de diyar kir ku ji ber hatina heyetê ya heremê gelek kêfxweş bûye. Hate diyar kirin ku di hevdîtina ku ji çapemeniyê re girtî domkiriye de mijarên wekî konferansa jinên Kurd, rola jinan ya aştiyê û birayra bêçaltiyê ya KCK'ê hatiye nîqaşkirin.

Li gorî agahiyên hatine bidestxistin, Barazanî ji endamên komê re gotiye ku, wan kerekî ku hetanî niha zilaman nekariye bikin, pêkanîne û wiha gotiye "Dê bi pêşengiya we lidarxistina konferansa neteweyî hêsantir bibe." Barzanî diyar kir ku vê xebata jinan ji bo welatên din yên Kurd lê dijîn jî bûye morelekî mezin û got, "Ev xebate moreleke mezin dide me hemû Kurdan." Barzanî ji jinan xwest ku beyî cudahî biçin cem hemû partiyan. Barzanî di hevdîtinê de da zanîn ku tekane daxwaza Kurdan aştiye û got ku pirsgirêka wan ne gelên tirk, fars an jî ereb e.

Heyata Hewldana Jinên Kurd, piştî hevdîna bi Barazanî re, bi Serokê Hikumeta Heremê Berhem Salih re jî hatin cem hev û heman mijar bi wî re jî nîqak kirin. Heyeta jinan êvarî jî dê tevli xwarina Salik ku ji bo şerefa wan daye, bibin.

**Endamên Hewldana Jinên Kurd, tevlî panela saziyên sivîl bûn.**

50 nûnerên saziyên sivîl tevlî panela ku di çarçoveya Roja Aştiya Cîhanê ya Neteweyên Yekbûyî de hatî lidarxistin bûn. Parlamentera berê ya DEP'ê Leyla Zana di panelê de axivî. Zana di axaftina xwe de bal kişand ser hewldanên xwe û got ku divê her kes berpirsiyariya xwe bicihbîne. Her wiha Zana destnîşan kir ku amadekariyên 2'yemîn Konferansa Jinên Kurd tê kirin û bi wê armancê hemû nûnerên saziyên sivîl re hevdîtinan pêktînin. Zana di dawiya axaftina xwe de da zanîn ku divê her kes ji bo yekîtiya Kurd û aştiyê xebatan bikin.



www.arsivakurdi.org

# BI TÊKOŞÎNEKE HEVPAR EM DIKARIN AZADIYÊ BI DEST BIXIN!

*Koma Jinen Bilind- KJB*

Di sala 1910an de duyemîn Konferansa Jinê ya Navneteweyî hate lidarxistin û bi pêşniyaza Clara Zetkîn 8ê Adarê weke Roja Jinên Kedkar ên Cîhanê hate qebûlkirin. Ji wê rojê heta niha sed sal derbasbûn. Di salvegera sedî de em rûmeta jinbûyînê û wateya wê, kesên ku di têkoşîna azadiyê de dijîn û dijînin hemû jinan silav dikin.

Di 8ê Adara sala 1857an de 129 jinên karker ji bo rojekê 8 saet kar kirin û di vê çalakiyê de hatin qetilkirin. Ji bo bîranîna van jinan ev dîrok hate hilbijartin. Lê jinên ku ji bo azadiya jinan têdikoşin dizanin ku beriya vê demê jî bi hezaran sal in ku berxwedana jinan heye. Ji pênc hezar sal heta niha jinan dev ji berxwedana xwe bernedaye. Bedêla vê jî li gorî dem û erdnîgariya ku tê de dijîn bi gelekî jî dan. Li Ewrûpayê bi sedan salane ku jin tên şewitandin. Li Rojhilata Navîn û gelek deveran jin weke namûs hate dîtin. Dema ku jinan îsyan dikir jî dihatin kevirkirin û qetilkirin. Dema ku dengê wan bû raman weke Gougesa li Olympê şandin giyotînê. Dema ku veguherîn nasnameya azadiya gelekî weke Leyla Qasim hatin dardekirin. Di tevahiya hemû dayîkan de gelek keser û fedekarî pêk hat. Lê jinên ku nebûn mahkûmên sîstemê, li ser navê mirovahiyê berxwedanên bêhempa pêş xistin. Di salvegera sedemîn de em van jinan hemûyan bibîr tînin. Girêdana me ya ji bo wan pêwîste ku em vê berxwedanê bêtir pêş de bibin û bi serkeftinê tacîdar bikin.

Di dîrokê de gelek jin di nava civakê de ji ber cinsiyeta xwe ne rehet bûn. Gelek jinan rexnedayîna vê yekê di şert û mercê ku tê de dijî de da. Ya herî girîng ev e, sîstema ku li ser koledariya jinê hatiye avakirin, bi berxwedaniya jinan û fedekariya wan ev civak ji holê ranebûyê. Bi ked û bedelên mezin hebûna me afirandin. Têkoşîna ku li ser navê azadî û civakê tê dayîn vala neçûye. Îro gelek tecrûbe, mîras û zanyarî ji bo me maye. Em weke tevgerên jinan yên ku ji bo azadiya jinan têdikoşin bawer dikin ku di vê sedsala dawî de em ê dîrokê watedar bikin.

Em îro hemû dizanin ku li tevahiya cîhanê mirovahî di rewşeke nebaş de ye. Ji dema ku 8ê Adarê Roja Jinê ya Cîhanê hatiye îlan kirin heta niha du şerên mezin ên cîhanê pêk hatin. Gelên Cîhanê faşîzm, nijadperestî, olperstî û gelek keser jiya. Di vî alî de herî gelek jî dayîk bi zarokên xwe re jiyiyan. Moderníteya Kapîtalîst bi destê Lîberalîzmê gelek pirsgirêk ji mirovahiyê re nîşan da. Ev pirsgirêk hê jî dewam dikin.

Di roja me ya îro de pirbûna nifûsê, kêmbûna çavkaniyên xwezayî, guherîna demsalan, bêwatebûna jiyanê, çekên nukleer, desthilatdarî, jinên ku weke pîrekan tê dîtin, li şûna exlaqê çanda tecawizê û bi dawîbûna polîtîkayan gelek pirsgirêk asta tevgera azadiya jinê jî derdixe holê.

Di sedsala dawî de rêxistinbûyîna jinan hê bêtir bi serkeftiye û bi zanyarî tevdigere. Em weke tevgerên jinan divê bi vê sedsalê re bi hêzeke mezin rû bi rû bimînin. Em dizanin ku ligel ewqas zext û zor têkoşîna azadiya jinê û mirovahiyê hinekî zahmet e. Her gava ku em davêjin ji aliyê sîstemê ve tê pûç kirin û bê wate tê hiştin. Lê tevî vê yekê jî ti şensê me yê din tineye. Divê em bi vê sîstemê re rû bi rû bimînin. Dema em vê yekê bikin divê em vê sîstema ku jinê afirandiye çareser bikin û pêş jinan bikin. Zilamtî û civaka desthilatdariya zilaman jinan ji holê rakirine. Heta niha ku ev çareserî pêk nehatiye ew jî ji ber zext û zora sîstemê ye. Lewra jin bênefes hatiye hiştin. Mirov nikare bûyereke civakî bi serê xwe binirxîne. Ji bo ku hun avabûna civakê ji serî heta binî lêkolîn bikin nêrîna jinê jî girînge. Dema ku nirxandinên li ser jinê were kirin pêwîste jin weke perçeyek sîstemê were dîtin. Em weke jin dema dîroka xwe dinirxînin em dizanin ku taybetmendiya sîstemê ya civakê jî dinirxînin.

Em dizanin ku rexnedayînên tevgera azadiyê ya jinan me têr nakin. Divê em bêtir berê xwe bidin dîroka moderníteyê. Lewra jin bi statûya xwe di nava civakê de nayê dîtin. Ev jî ji ber zehniyeta moderníteya zilaman tê. Jin di tariyê de hatiye hiştin û nasnameya wê bi koledariyê hatiye naskirin. Ev yek bi desthilatdariya dewletê ve girêdayiye. Bi zextên gelek mezin ev yek rewa hatiye dîtin. Divê ev yek ji aliyê jinan ve were çareserkirin û rexnedayîneke xurt ji aliyê jinan were kirin. Heta ku em jinê fêmnekin em nikarin civakê rast bidin naskirin. Ji bo jinan navên xerab tê bikaranîn û ev yek jî ji aliyê zilaman û bi berpirsiyariya wan pêk tê. Divê em vê yekê çareser bikin.

Sîstema Kapîtalîst bi komkûjiyên jinan xwe vedişêre û bi şîddetê xwe li ser piyan digire. Vê yekê jî bi amûrên weke makyajê bikartîne. Divê em nekevin xefka vê

Rue Jean Stas 41 1060 Bruxelles tel: 00 32 2 647 30 84 fax: 00 32 2 647 68 49
Homepage: www.kongrakurdistan.net E-mail: kongrakurdistan@gmail.com / komisyonajinan@gmail.com

www.arsivakurdi.org

azadiya sextekar. Rûmeta jinê nirxên jiyana komûnal nîşan dide û divê li ser vê yekê em rexnedayînê xwe bidin. Divê em rastiya ku zilam jinê afirandiye derbas bikin. Bi hezar salane ku bi komplo û lîstikên xerab jin hatiye perçiqandin.

Ji ber vê yekê divê em eynikê ji dîroka xwe ya taybet re bigirin û wisa di bîra xwe de bihêlin. Dema em salvegera sedemîn bi wate dikin belkî jî ji bo ku dîroka me ya di tariyê de maye em ronî bikin, em pirsan ji xwe bikin. Ewqas bedel hate dayîn û çima hê jî em bi zextan re rû bi rû ne? Çima em trajediya herî mezin a mirovahiyê dijîn?

Çima di bingeha komkujiyên xweza û civakê de koledariya me heye? Çima ji bo ku em van derbas bikin hêza xwe nîşan nadin? Me hindikî şer nekir. Me hindikî ked neda. Em hindikî neqeherîn û nehatin qetilkirin. Di sedsala dawî de ji bo ku pirsgirêka jinê çareser bibe me hindikî nenivîsand û nefikirî. Di nava civakê de jî ji bo jinê lêpirsîn hate destpêkirin. Lê pirsgirêka me yî herî mezin ewe ku rastiya me yî qetilkirinê ne sekinî û ne jî kêm bû.

**Dîroka Koledariya Jinê û Têkoşîna wê ya ku ji vê Koledariyê Rizgar bibe hê nehatiye nivîsandin**

Jin, nizane ka wê, çi, li kuderê û çawa wenda kiriye. Ji ber vê yekê bi kêmasiyan derketina rê aliyê azadiya me nîvco hişt. Dema ku em dîroka azadiya xwe rastî nenivîsînin, em nagihîjin jiyaneke azad. Di dîroka mirovahiyê de nakokiyên ku li ser jinê derketine holê û rastiya îro divê em ji nûve lêkolîn bikin. Tevgerên Feminîst jî bi vê kêmasiyê tevdigeriyan û wisa derketin rê. Ji ber vê yekê her çiqas dema ku jin bi ked û fedekariyeke mezin xwe nîşan didin jî rastiya dîrokê jinê di tariyê de maye û desthilatdariya zilaman li ser jinê xwe bikaraniye. Me jî bi bîrdoziyeke mezin bersiva vê yekê neda.

Weke tevgerên jinan me xeyal û felsefeyên Moderníteya Kapîtalîst derbas nekiriye. Hem ji aliyê zihnî û hem ji aliyê bîrdozî ve me li dijî bingeha moderníteya kapîtalîst alternatîfek neafirandiye. Tevgerên ku li ser navê azadiya jinê derketin rê desthilatdariya zilaman nirxandin lê tiştên ku moderníteya kapîtalîst bi serê jinê de anîne ewqas nenirxandin. Ew jî ji ber ku di nava hev de negirtine dest.

Di encam de hem ji aliyê bîrdozî hem ji aliyê zihnî ve me alternatîfek neafirand. Jinan, koledariya ku li ser zîhniyet, hest û bedena jinê hatiye avakirin derbas nekir. Felsefeya ku vê ji holê rake jî pêş nexistin.

Tevgereke Civakî ku xwe li Azadiya Jinê ranegire nikare biserkeve.

Tevgerên Netewî yên ku li ser navê Sosyalîzmê derketin rê, ji ber nêzîkatiya wan ên li hemberî jinê bi serneketin. Di sedsala 20. de tevgerên ku li ser navê azadî û civakê derketin rê jî ji ber nêzîkatiyên wan ên li hemberî azadiya jinê civakek azad ava nekirin.

Dema ku ev rastî ji aliyê tevgerên jinan ve baş hatiba nirxandin wê ev wendakirin dubare nebûyana. Careke din derket holê, ku azadiya jinê azadiya civakê nîşan dide. Encamek din jî eve, dema ku ji aliyê tevgerên jinan ve pirsgirêka jinê bi pirsgirêkên civakî neyê nirxandin û bi rêxistinên demokratîk re tevnegerin wê wenda bikin.

**Pirsgirêka Azadiya Jinê bi Riyên Hiqûqî nayê Çareser kirin**

Di destpêka tevgerên Jinan de ji bo hiqûqê têkoşîn hate dayîn. Ev têkoşîn ji bo ku pirsgirêkê têxin rojevê û nîqaş bikin girîng bû. Ev yek bi piranî bi serket. Lê em dibînin ku ji bo çareserkirina pirsgirêkê şoreşeke mezin û guhertinek nehat kirin. Lewra pirsgirêka azadiya jinê ne tenê bi hiqûqê sînor kiriye. Dema em li dîroka jinê dinêrin bûyereke civakî ye. Tiştên ku di hiqûqê de hatine kirin jî tenê di fermiyetê de cihê xwe digire.

**Nêrîna Jinê ya Polîtîkayê divê ji Nêrîna Zilamtiyê were Rizgar kirin**

Pirsgirêkên ku em di têkoşîna azadiya jinê de dijîn ew e, ku em tecrûbeyên xwe li qada polîtîkayê bikar naynin. Belkî jî em li şeklê polîtîkaya zilamtiyê dinêrin û dibêjin ev karê zilaman e. Têkoşîna Azadiyê, divê polîtîkayeke xwezayî û bi ehlaqî tevbigere. Ji bo serkeftinê jî em di vê baweriyê de ne. Di sedsala derbasbûyî de em weke tevgera jinan me polîtîkaya azadiya neafirand. Li ser navê nirxên jinê me çanda siyasetê avanekir.

**Em çi bikin?**

Pirsgirêkên ku em dijîn, tecrûbeyên ku me bi dest xistiye û mîraseke bi hêz ku ji me re maye divê em bi têkoşîneke mezin çareseriyê biafirînin. Lewra her çiqas ku tesîra jinan li ser civakê kêmbûye jî, ji nirxên xwe yên komunal dûr neketiye. Her ku zextên li ser jinê derdikeve holê pirsgirêka jinan dibe aloziyek. Çareseriya pirsgirêka jinê, civakê çareser dike, civak jî wê sîstemê çareser bike. Di her aloziyê de şensê guhertinê heye. Gavên ku ji bo azadiyê jinê were avêtin wê ronahiyekê bi xwe re bîne.

Ji ber vê yekê em dibêjin ji aloziyên rojane azadiya jinê dikare bi serkeve û tiştên ku em dikarin bikin weke pêşniyaz me li jêrê nivîsiye:

**Zanîna qezenckirina di warê ramanî de, afirandina zihniyeta jina azad e**

Berî hertiştî em difikirin ku divê azadî wisa berfireh bibe ku karibe bersivê bide pirsgirêkên me tesbît kirine û buhranên ku di nava civakê de xwe didin der. Ji bo vê yekê bi pênaseke felsefî û îdelojîk a ku karibe xwe ji

www.arsivakurd.org

giyana koletiyê rizgar bike pêdiviya me heye. Divê em serdestî û yekdestiya zilaman a li ser jinê ya moderniteya sermayedar di zihniyet, raman, çalakî û giyana xwe de hilweşînin. Em dikarin ji bo jinan û hemû mirovên bindest paradîgmaya xwe ya azadîxwaz biafirînin. Li dijî êrişên îdeolojîk ên pergala mêrsalarî divê bi awayekî têkûz em bi îdeolojiya azadîxwaz a jinê têbikoşin. Ji ber ku hemû têkoşîn bi utopyayan destpê dikin û pêşî di qadên îdeolojîk û ramanî de tên qezenckirin. Divê raman û hestên bi rêya teslîmeyetê li me tên ferzkirin, em di warê îdeolojîk de têk bibin. Bi xwespartina tecrubeyên zanistî û pêzanînên bi hezaran salan ên jinan ên ji bo pêkanîna civakîbûnê, divê em zihniyeta xwe biafirînin. Ji bo vê yekê bi hewldana ronakbîrî em dikarin kodên mêrsalarî û koletiya jinan deşîfre bikin û vê rewşê biguherînin..

**Riya çareseriyê wê bi jin-nasiyê (Jinelojî) pêk were**

Tiştê em pêşniyaz dikin, pêşxistina jin-nasiyê ye. Jin-nasî dikare pirsgirêkên bingehîn ên mirovahiyê yên weke serjimarî, estetîk, sinc, aborî û hwd çareser bike.

Jin di pêkanîna sinc û estetîzma jiyanê de xwedî roleke diyarker e. Ji bo nirxandina pîvanên baş û xirab ên perwerdeya mirov, girîngiya jiyan û aştiyê, xirabiya şer, mafdarî û edaletê û biryardayîna di van waran gişan de jin realîstir û berpirsiyartir tevdigere, ev yek di xwezaya wê de heye.

Aborî hê ji destpêkê ve çalakiyeke civakî ya jinê ye û têde jin xwedî roleke sereke ye. Marksîzm jî di navê de ti îdeolojiyê heta niha mafê jinê radestî wê nekiriye. Aborî-polîtîka Marksîst jî ne kariye xwe ji têgihîştina moderniteya sermayedar rizgar bike, wekî din, ji aliyê awira sinifî jî xwe ji nêrîna serdest a burjuwaziyê xilas nekiriye. Wê jî ked û nirxê bi têkiliya karker û patron ve girêdayaye, zemînên civakî yên pêvajoya hemû dîrokê îhmal kirine û di tarîtiyê de hiştine. Nirx berhemeke dîrokî ya civakê ye. Bêyî keda belaş ên jinên ku afirînerên civakê ne, nirxandin û analîzkirina dîrokê, zanistên civakî û aboriyê, gelek tişt bi hêzên demokratîk û şoreşger ên civakê dane windakirin. Hêzên mêrsalarî yên şaristaniyan keda jinê heta dawî îsmîsmar kirine û ti nirxa madî-manewî nedane keda wê. Ji bo her xebatê nirxek hatiye desnîşankirin, lê belê ji bo ducaniyê ku keda herî giran e, ji bo mezinkirina zarokan û karûbarên malê û koletiya cinsî ya jinê ti nirx nehatine dayîn.

Em jin berî hertiştî divê bi jihevxistin û rexnekirina teoriya ked-nirxê destpê bikin û sincê civakî ji nûve li ser hîmê azadiyê saz bikin. Heta ku ev têgihîştina li ser ked, xesp, înkar, dizî û berxwarina jinê ji holê neyê rakirin, civakeke xwedî sinc jî ava nabe. Di aboriyê de heta ku ewçend karûbarên der-sincî hebin, divê em jî têgihîştineke nû ya aboriyê û karûbarên li gorî wê bi pêş bixin. Ji ber vê yekê yek ji lingê bingehîn ê zanista jinê, divê aborî be. Bi vê ve girêdayî, afirandina kooperetîfan weke aboriya alternatîf wê ji bo civakîbûna nû bibe xwedî roleke diyarker. Aboriya ku ji destê jinan hat standin û radestî bazirgan, tefecî, û rayedarên dewlet û desthilatdaran hat kirin, derbeyeke mezin li debara civakî xistiye.

Dema em li rêyên çareseriyê bigerin, em dikarin zanista jinê jî ji guftugoyê re vekin. Fenomena jinê ya ku me diyar dike, em nikarin bi destê sosyolojiya mêrsalarî û şaxên zanistî yên zayendgir ve berdin. Hem ji bo derxistina holê ya statuya jinê, hem ji bo pêşxistina teoriya pêwîst a tevna bername, rêxistin, û çalakiyên ji bo rizgarkirina jinê di rojevê de bicihkirina mijara zanista jinê karûbarekî pêwîst û lezgîn e. Eger em vê yekê nekin, hewldanên li holê çiqas mezin bin jî, wê nikaribin ji wate û çarçoveya karûbarên lîberal ên jinan ên rihetkirina sîstema heyî, derkevin.

**Ji bo zihniyeteke azad Akademiyên jinên azad**

Em ancax bi sazîbûneke hişî ya sihî dikarin fam bikin ka mirovahî û jin çawa bi diyarde û têgehan tên fetisandin û li ser vê yekê sîstema deshilatdar tê sazkirin û domandin. Ji bo vê yekê jî, weke jin di serî de divê em di warên ronakbîrî yên teorîk de bi serkevin. Di rexnekirin û şikandina qalibên ku dest û zimanê mêran ji me re çêkirine wêrektir tevbigerin û ramanên xwe yên alternatîf biafirînin. Ji bo vê yekê divê saziyên jinan ava bikin û têde nasnameya jinê derxin holê, bi nêrînên xwe bi awayekî rêkûpêktir jinan û tevahiya civakê agahdar û ronî bikin. Çi têgeh û saziyên ku jinan ji jinbûnê dûr xistine, divê em bi gişan re hesabê xwe bibînin û li dijî wan têkoşînê geş bikin û ji bo vê jî xebatên ronakbîrî û yên akademîk ên ku jinan li xwezaya wan vegerînin pêwîst û acîl in.

Em jin divê hêviya xwe girênedin bi lêgerîna mafan li saziyên zanistî, siyasî û hiqûqî yên fermî û nema wext winda bikin bi hêviya bidestxistina wekheviyên şeklî; divê em ji bîr nekin ku çareseriyên pirsgirêkên me di nava civakê bi xwe de ne. Helbet emê ti kozikên xwe yên ku bi têkoşîneke dûrûdirêj bi dest xistine, bernedin. Lê belê emê tesbît bikin ka nifteyên hişkegirêkên pirsgirêkên me yên jiyanî li kuderê ne û ji bo çareseriya wan zêdetir serê xwe biêşînin.

Zanistên civakî jî di navê de emê karakterên zayendgir ên saziyên zanistî li ber çavan bigirin û akademiyên siyasî û çandî yên karibin ji bo pêdiviyên civakê bibin bersiv saz bikin. Hemû tevgerên civakî yên dixwazin bi felsefeyeke nû civakê veguherînin, li gorî şertên xwe di dîrokên nêz an jî dûr de dest bi avakirina saziyan kirin. Di vê mijarê de tevgerên femînîst ji nîvê duyem ê sedsala 20an a heta îro xwedî mîraseke dewlemend a ronakbîrî û zanistî ne. Li ser vê bingehê, em dikarin afirandinên baş ên civaka ronakbîr a demokratîk û azad ên dijberî moderniteya sermayedar



www.arsivakurdi.org

bineqînin û akademiyên xwe li ser bingeheke sihîtir saz bikin.

Krîzên civakî, siyasî, çandî, aborî û ekolojîk ên li tevahiya cîhanê rû didin, şoreşeke jinan ferz dikin. Ev şoreş wê bibe şoreşeke civakî. Şoreşeke civakî ya wisa jî sazîbûneke xurt a ronakbîrî û çandî ferz dike. Ango divê em hiş, ziman, awir, estetîk û sinceke jinê ya ku tesîrê li hemû cîhanê bike û baweriya bi projeyên me yên çareseriyê zêde bike, biafirînin. Divê ev sazîbûnên jinan ên di mijara azadiya jinan de xwedî têkoşîn û hewldanên cidî û berdewam bin, hem li hundir hem jî li derve bi hev re di nava hevkariyê de bin û tevna xwe bigihînin her derê. Di rewşa heyî de beş, enstîtu û kursiyên ji bo jinan ên li zanîngehan têra xwe hebin jî, li her derê cîhanê zanist, zanîngeh û dezgehên stratejîk di destê hêzên sermayedar û mêran de ne. Di vê rewşê de jî ne pir diyar e ku mirov nikare behsa hilberîna ramana serbixwe ya jinan bike.

Ji ber vê yekê divê em qebûl bikin ku em dereng jî mane di avakirina akademiyên xweser ên jinan ên di çareseriya pirsgirêkên me û şoreşa me ya civakî de xwedî rolên girîng bin, û xebatên xwe jî bêderengî bidin destpêkirin.

Divê em karibin van akademiyan di bin banê konfederasyonên asta gerdûnî de birêxistin bikin.

Ji çandên xwecîhî û akademiyên herêmî-netewî li ser dilxwaziyê jî gelek kes dikarin di van akademiyan de cih bigirin.

Saziyên em biafirînin, divê nebin teqlîdên ku sîstema baviksalariyê xurt dikin, lê belê bêhtir tiştên hêjayî azadkirina jinê hilberînin.

Divê rêzik, pergal û kargeriya van akademiyan em li gorî pêdiviyên jinan destnîşan bikin, û ji bo cih awayên sazkirina wan diyar bikin û pêzanînên xwe bi hev re parve bikin, em dixwazin mijarê ji guftugoyan re jî vekin.

Di salvegera sedsaliya 8'ê Adarê de, weke pêwîstiya nîşandana dilsoziya xwe ya ji bo kesên di şertên dijwar de têkoşîna mafên jinan meşandine, û bêhejmar xebatên teorîk pêkanîne, em vê xebatê dinirxînin. Em vê xebatê weke silavdayîna li hemû kesên ku di tevahiya dîrokê de ji bo jinan û mirovahiyê berdêlên giran dane, binirxînin.

**Rizgarkirina jinê ji rewşa neteweya mêtîngeh a herî**

Me nekarî xwe rizgar bikin ji formasyona civakî û çandî ya ku temsîla modernîteya sermayedar dike. Ji ber ku me bi qasî pêwîst nekarî dest werdin van formasyon û zextên civakî û çandî yên ku ji fizîka me bigire heta hest, giyan û wergirên me yên civakî, her tiştên me dagir kirine, me hê jî ne xwe ne jî civak ji vê dojeha ku dor li mirovahiyê girtiye, rizgar nekiriye. Pergala heyî hê jî bi awayekî rojane li gorî pêwîstiyên mêran şekil dide jinê. Ev pergal çi mêr çi jî jin herkesê dike hevparên sûcê xwe.

Krîz û buhranên civakî gelek caran bigihîjin asta fahşbûnê jî, hê jî emperyalîzma çandî û guhertoyên din ên modernîteya sermayedar a ku mirov kiriye êsîr, nehatiye têkbirin. Ji ber ku femînîst nikarin xwe ji asoya demokrasiyên navend rojavayî dûr bixin, û nikarin awayê jiyana sermayedar têbigihin û xwe jê rizgar bikin, tevgerên wan jî qels dimînin û bi ser nakevin. Heta ku ev dorpêçkirina çandî ya sermayedar neyê şikandin, ewê hertim weke diyardeyeke ku teslîmiyetê li ser me ferz dike, li ser serê me weke tehdîdekê hebûna xwe bidomîne. Li her derê cîhanê, bi reng, şêwe, çarçove û kirasê xwe cihêreng be jî ev pergala zilmê li ser mirovahiyê dewam dike. Ji ber vê yekê di vê pergala ku bi taybetî jinê dorpêç dike, divê hemû karakterên wê yên weke tacîz, tecawiz, mode, cinsiyetgirî û çanda malbatî yeko yeko werin hûrkolîn û analîzkirin.

Şaristaniya ku herî zêde li ser jinan lîstik gerandiye kapîtalîzm e û vê pergalê îstîsmarkirina jinan kiriye mîna sazî û dezgeh. Li gel vê yekê jî piraniya jinan pîvanên vê pergalê ecibandine, û ji xwe re weke taybetmendiyên azadî û nasnameyî qebûl kirine. Cinsgiriya civakî ya sînornenas, desthilatdarî û kedxwariyê li ser jinan ferz kiriye û ew kiriye êsîra mêr-destilatî û veguherandiye pêlîstoka desthilatdaran, ji ber vê yekê ne mumkun e mirov di vê sîstemê de rûmet, rêzdarî û heqîqeta jinê bibîne.

Di sedsala borî de, jin dîsa qels mane di têkbirina vê têgihîştin û awayê jiyana ku ji aliyê kapîtalîmê ve hatiye sazkirin de. Pergala navend rojavayî azadiyeke qismî daye jinan, lê belê berdêla vê li ser jinê pir giran bûye. Tiştê ku jin pê nehisiyaye jî ev berdêl bûye. Mesela ti şaristaniyê bi qasî ya Ewrûpayê bi peymanan jin bi mêr ve girênedaye û ew nekiriye objeyeke cinsî.

Cinsiyetgirî weke îdeolojî herî zêde di serdema lîberalîzmê de hatiye pêşvebirin û bikaranîn. Xefika ku modernîteya sermayedar li pêşiya jinê saz kiriye jî ev e. Jina ku azad xuya dike di eslê xwe de di nava vê sîstemê de bûye aleta herî rezîl a îstîsmarê. Lîberalîzm bi vê jî têr nebûye, herwiha bi awayekî pir hostane wê jin veguherandiye guhertoyên îdeolojîk jî. Ev yek jî dibe weke ecibandina koletiya xwe.

Mirov dikare bibêje ku pergal weke îdeolojî û madî bi îstîsmarkirina jinê ne tenê xwe ji buhranên herî giran jî rizgar dike, herwiha hebûna xwe jî dixe bin ewlekarî û misogeriyê. Jin bi giştî di nava dîroka şaristaniyê de bi taybetî jî di nava modernîteya sermayedar de weke netewa mêtîngeh a herî kevin û herî nû ye. Eger ji her aliyî ve rewşeke buhranê ya berdewam hebe, di vê de para mêtingehbûna jinê sedema sereke ye.



www.arsivakurdi.org

**Di azadbûna jinan û qada civakî de jêpirsîna evîn, malbat, têkilî û zewacê**

Têkoşîna ku tevgera femînîst demeke dirêj bi slogana 'tiştê taybet siyasî ye' meşand û deşîfrekirina şîdeta nava malbatê û desthilatdariya sergirtî ya jin-mêr ji xwe re kirine hedef, ji hemû deman girîngtir e. Eger em nikaribin serdestiya zilam a di nava malbatê û nava civakê de bişkînin, xeyalên ku em li wekhevî, azadî, demokrasî û sosyalîzmê bar dikin jî wê bivênevê bişkên. Ji bo xwegihandina wateyên rastîn ên azadî, wekhevî, demokrasî û sincê divê em têkiliyên heyî yên navbera jin û mêr jêpirsîn bikin. Jinên ku nikaribin koletî, teslîmiyet û girêdanê di cîhan hest û giyanê xwe de têk bibin, ne mumkun e di têkoşîna demdirêj a rizgariya jinê de rolên girîng bilîzin.

Divê em karibin afirandina jiyaneke civakî ya têde jin bi awayekî fizîkî, giyanî û hişî xurt bibe, guftugo bikin. Ji malbata mêrsalarî, ji jiyana civakî ya li ser bingeha koletiya jinan sazbûyî ber bi sazkirina sîstema malabateke xwe bispêre azadî û wekheviyê, divê em gavên mezin bavêjin û mijarê bi awayekî cidî di rojeva xwe de bicih bikin û binirxînin.

Em bawer dikin ku pêwîst e em helwesta di der barê jinê de weke şoreşeke çandî analîz bikin. Heta niha jin bi çand û sinceke li dijî xwe hatiye dorpêçkirin. Jin û mêr di nava vê çand û sincê de çiqas dilpak bin jî, çiqas xwedî hewldan bin jî, nikarin çareseriyeke watedar û azadîxwaz bibînin ji bo vê pirsgirêka ku çavkaniya wê xwe digihîne têkilî û nakokiyên kokdar. Divê em di bîra xwe de bigirin ku nasnameya herî kokdar a azadîxwaz bi nirxandin, analîzkirin û têgihîştina ji jinê û têkiliyên jin û mêr mumkun e û ancax bi wî awayî di warê civakî de çareseriyek dikare were dîtin.

**Bi çalakiyên radîkal û demokratîk ber bi tevna têkoşîna hevpar**

Perspektîfên çareseriyê yên di xalên jor de me destnîşan kirin, têkoşeriyeke bi îdîa, kokdar, rêxistinkirî û berdewam û xêza çalakiyê ferz dikin.

Emê afirîner bin, bi înat, coş û ewlehiya sînornenas a ku bîranînên wan ên manewî, emê pêlên ku sîstema mêrsalar rakirine bişkênin û ber bi hêla îstîqameta têkoşîna xwe ve biqulibînin. Di dîroka me de bêhejmar bîranîn û lehengên birûmet hene. Hemû jî bi êş, evîn, ked û wêrekiyê hatine afirandin. Ji bo bîranîna rojeke wisa emê têkoşeriyeke ku tercîhên pêdivî û jiyana azad xwe ferz dike, biafirînin. Em dikarin çalakîvaniyeke kokdar û demokratîk bi pêş bixin. Bi rojevên hevpar, emê çalakîvaniya xwe ya hevpar bi afirandina tevna danûstandinên zexim organîze bikin.

**Li hemberî çanda şîdetê têgihîştina xweparastinê û piştgiriya hevpar**

Civaka cinsiyetgir a em têde dijîn, ne tenê dewlet, civak bi xwe jî veguheriye çavkaniyeke şîdetê. Di rewşeke wisa de jî li her welatî û di her çandê de yên berî herkesî dibin hedefên şîdetê, jin in, jinên bêparastin in. Ji ber vê yekê bi wesîleya vê danezana di der barê çareseriya pirsgirêka jinan de, em dixwazin careke din bibêjin li hemberî saziyên rêxistinkirî yên şîdetê yên mîna dewletê, û li hemberî şîdetên sergirtî yên di nava civakê de jin xwe biparêzin. Li ser vê bingehê ji bo ku jin karibin xwe li himberî ewçend hêz û saziyên şîdetê biparêzin, divê bi têgihîştina xweparastinê, tevna xwe ya rêxistinî, çalakgeriya xwe û piştgiriya xwe ya hevpar biafirînin.

**Ji bo sazkirina modernîteya demokratîk helwesta kokdar a paradîgmatîk**

Modernîteya demokratîk dibe navekî din ê şaristaniya civaka xwezayî ya veşartî ya ku di nava dîroka mirovahiyê de li himberî şaristaniyên xwedî pergala baviksalarî li berxwe daye û jiholê winda nebûye. Ev pergala demokratîk di serî de rizgarkirina jinan, rizgarkirina hemû derdorên civakî yên bindest û yên zirar ji sîstema baviksalarî dîtine, ji xwe re kiriye hedef. Hemû hêzên civakî yên xwe dispêrin modernîteya demokratîk divê xwezaya jinê û tevgera azadiyê jî xwe hêzên bingehîn ên pêşvebirin û hevgirtinê bihesibînin û xebatên xwe jî ji bo jinûve sazkirina civakê di wê çarçoveyê de bimeşînin. Û girîng e ku were zanîn ku heqîqeta jinê ji cinsiyetê wêdetir, aliyên wê yên aborî, civakî, çandî, îdeolojîk û siyasî jî hene.

Tevgerên têkildarî jin û hawîrdorparêziyê heta ku xwe ji çerxa modernîteya sermayedar rizgar nekin, ne mumkun e bi awayekî hevgirtî ber bi armancên xwe ve bimeşin. Xwegirêdana wan a bi tevahiya tevgera civaka demokratîk ve ji bo hevgirtin û serkeftinê pêwîst e. Ji bo vê yekê jî di azadbûna jinê de gava yekemîn a avêtinê hêza çalakiya jinê bi xwe ye; û xwedûrxistina wê ya ji helwesta sermayedariyê ye.

Eniya şaristaniya demokratîk bi awayekî xwezayî ji xwe re kiriye armanceke pîroz û peywireke lezgîn ku mîrasa hemû serdemên berê di ber çavan re derbas bike, ji wê mîrasê rahêje tiştê pêwîst, tiştên kêm jî di çarçoveya pêdiviyên rojane de telafî bike, û pêngava xwe ya îdeolojîk pêk bîne. Eger li ciyekî û di demekê de zextûzor, îstîsmar, pişaftin û astengî gihîştibin radeya herî dijwar, û jiyan veguherîbe bêrûmetiyeke ji mirinê jî xirabtir, ji paradîgmeyeke kokdar pê ve ti çareyeke din li ber me namîne.

Weke jin em dizanin ku pirsgirêkên me bi awayekî giştî yên aîdê şaristaniya baviksalarî ne. Em ancax bi hevgirtina xwe ya rêxistinkirî dikarin li dijî van



www.arsivakurdi.org

pirsgirêkan têbikoşin û çareser bikin. Ji bo vê yekê berî hertiştî pêdiviya me bi platformên wisa hene ku em karibin têde pirsgirêkên xwe û çareseriyên wan bikin hevpar.

Di salvegera 100 emîn a 8'ê Adarê de divê em dilsoziya xwe ya bi bîranîna hemû jinên têkoşer û berxwedêr, bi dengekî bilind bînin ziman. Dîsa bi heman awayî li ser bingeha nirxên jina dayîk ji bo cîhaneke alternatîf ya were birêxistinkirin, û ji bo têkoşîneke biserûbertir, biîstîkrar û kokdar jî divê em îdîa û biryardariya xwe nîşan bidin.

Li himberî koletiya pênc hezar salan a ku em winda bikin, azadiyeke hetahetayî weke qezenc li benda me ye.




## KONGRA NETEWI YA KURDISTAN - KNK

Kongreya neteweyî ya Kurdistanê ji nûnerên partî, rêxistinên siyasî, civakî, rewşenbîr û kesayetiyên welatparêz yên Kurdistanî ku bi mebesta avakirina dezgeheke bilind ya Kurdistanî, ji bo parastina berjewendî û yekîtiya neteweya Kurdistanê, di roja 26 Gulan 1999 de hate damezrandin.

Kurdistana ji aliyê dewletên dagirker, Tirkiye, Îraq, Îran û Sûriyeyê ve ku hatiye parçekirin û Neteweya Kurd di bin destê van dewletên dagirker de ye û ji hemû mafên xwe yên neteweyî û demokratîk hatiye bêpar kirin. Herweha bi dereceyên ji hev cuda be jî, li seranserê Kurdistanê, polîtîka şer, îmha û inkarê bi israr tenê domandin.

Li Kurdistanê, kêmaniyên Asûrî-Suryanî-Kildanî, Ermenî, Cihû, Ereb, Tirkmen, Azerî, Tirk û Faris jî hene. Ew jî hevparên neteweyê Kurd in. Azadî û rizgariya wan, bi azadî û rizgariya neteweyê Kurd ve girêdayî ye.

Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê KNKê ji nûnertiya 130 endaman pêk tê. 6 komîsyonên xebatê yên KNKê hene. Bi komîsyona karê derve, ziman û perwerde, çand û huner, hiqûqa navxweyî, weşan û çapemenî û komîsyona jinan kar û xebaten xwe dimeşînê.

Komisyona Jinan; ji bo azadiya jin û parastina mafên xwe, ji bo civakekê azad û wekhev û avakirina yekîtiya di navbera jinên herçar parçeyên Kurdistanê de têdikoşê.

Kombûna Civata Giştî ya 10min, bi amadebûna 105 delege, ji wan 11 delegê jin, di nevbera 23-24ê Gulanê li paytexta Belçîka Brukselê hate li darxistin. Di kombûnê de gelek nûnerên civaka sivîl jî amade bûn û li ser gelek xalen girîng hate rawestandin. Rojeva herî girîng a ku li ser hate rawestandin ev bû, divê dema ku her çar parçên Kurdistan di pêvajoyeke hesas derbas dibe de, gihiştina yekîtiya neteweyî bû.

www.arsivakurd.org